# Li Başûr projeyên Nîzamettîn Taş û MÎT'ê

**Ji rêveberên MÎT'ê yên di destê HPG'ê de ne Aydin Gunel got ku Nîzamettîn Taş ji bo li dijî PKK'ê partî ava bike bi MÎT'ê re hevdîtin pêk aniye**

JI RÊVEBERÊN Teşkîlata Îsbarata Millî (MÎT) yên girtî Aydin Gunel diyar kir ku di sala 2017'an de bi Nîzamettîn Taş re hevdîtin kirine û Serokê Daîreya Operasyonê ya MÎT'ê Mehmet Levent Turkgucu û Serokê Daîreya Koordînasyonê ya MÎT'ê Yûsûf Serkan Paksoy jî tev li van hevdîtinan bûne. Di hevdîtinan de 'karê ji bo avakirina partiyeke li dijî PKK'ê' hatine nirxandin.



AYDIN Gunel diyar kir ku hevdîtin bi navbeykariya Rêxistina Îstîxbaratê ya PDK'ê (Parastin) li bajarê Selaheddîn ê başûrê Kurdistanê pêk hatin. Di hevdîtinê de berpirsyarê maseya PKK'ê ya Parastinê Salih Barzanî, nûnerê MÎT'ê yê Hewlêrê Selçûk Şenel û tercûmanek jî amade bûne. Taş ji MÎT'ê xwestiye ku bi partiyên Hak-Par, PAK û PWD'ê re li hev kom bibin û li Tirkiyeyê partiyeke legal ava bikin... RÛPEL - 3

e-rojname

5 Kanûn - Çarşem 2018 E-mail: e-rojname@hotmail.com Hejmar: 195

## 'Êlek Zer' bi ser ketin



Li Fransayê berxwedana 'Êlek Zer'an ku 17'ê mijdarê li dijî zêdekirina bihayê sotemeniyê li Parîsê dest pê kir û bû rojeva sereke. Serokwezîr Fransayê Edourd Philippe diyar kir ku ne pêkan e ku daxwazên çalakgeran piştguh bikin û heta 6 mehan bihayên sotemeniyê û bacan zêde nakin... RÛPEL - 4

# Grev gihîşt meclisê

### KET ROJA 28'EMÎN

Hevseroka KCD'ê û parlamentera HDP'ê ya Colemêrgê Leyla Guven ji bo tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan were rakirin 28 roj in di Girtîgeha Tîpa E ya Amedê de di greva birçîbûnê ya bêdem û bêdorveger de ye. Grevên birçîbûnê li Kurdistan û gelek welatan berbelav dibin.

### 10 WEKÎL KETIN GREVÊ

Hevseroka HDP'ê Pervîn Buldan û 9 parlamenterên HDP'ê li meclisa Tirkiyeyê li dijî tecrîdkirina Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan dest bi greva birçîbûnê kir. Pervîn Buldan, diyar kir ku cihê herî zêde meseleya tecrîdê bê niqaşkirin meclis e û ji ber vê yekê li meclisê dikevin grevê.

### LI HEWLÊRÊ PIŞTGIRÎ

Li Hewlêrê 15 roj in li dijî tecrîdê greva birçîbûnê hatiye destpêkirin û Hizba Zehmetkêşanî Kurdistanê û Bizûtnemeweyî Demokrasî ya Gelê Kurdistanê piştgirî dan çalakiyê. Her wiha li gelek welatên Ewropayê jî grevên birçîbûnê hatine destpêkirin û herî dawî li Îtalyayê jî komek ket grevê... R.3




## Çalakîya Leyla Guvene qîrayîşêk a




Parlamenteranê HDPyî yê Amedî dayî zanayene ke çalakîya Leyla Guvene hemverê tecrîdî de qîrayîşêk a û ganî no qîrayîş bêro eşnawitene û vatî: "Tecrîd bi usûlanê cîya cîyayan yeno xorî kerdene. Çalakîya Guvene qîrayîşêk a û ganî bêra eşnawitene."... RÛPEL - 5

## Tirkiye sûcên mirovahiyê dike

Beşdarên komcivîna navneteweyî ya der barê Paqijiya Etnîkî û Guhertina Demografîk a li Efrînê de axivîn û gotin ku Tirkiyeyê li Efrînê sûcên şer kiriye û welatiyên êzidî neçarî misilmanbûnê kirine. Gelek navendên olî û perestgehên taybet ên êzidî û elewiyan hilweşandine. Navenda Belgekirina Binpêkirin û Destdirêjiyên li Bakurê Sûriyeyê diyar kir ku destdirêjiyên ku li Efrînê û herêmên di bin serweriya çeteyên "Mertala Firatê" rû didin dikeve çarçoveya sûcên dijmiroî û sûcên şer û divê Dadgeha Sûcên Navneteweyî bikeve nav hewldanan.



### Ji zilma dewleta tirk direvin

Li gundê Hespenek a navçeya Erdîşa Wanê Malbata Polat a ku leşker û polîsan 2 caran xaniyê wan şewitand û gelek caran bi ser malê de girt. Malbatê ji ber zilm û zordariyê ji warê xwe yê bi sadan salan e lê dijîn bi hêsirên çavan koç kirin. Malbata Polat diyar kir ku ji ber zilma li wan tê kirin neçar man koç bikin.

## Kanada de grevê vêşanîye

Destpêkerdişê grevê veşaniye yê Leyla Guvene ra dima teberê welatî de zî çalakîyî û grevê veşanîye dest pêkerdî. Bajarê Hildesheîmî yê Almanya û bajarê Toronto yê Kanada de semedê vervindertişê tecrîdî grevê veşaniye ame despêkerdene... RÛPEL- 5

ÇAND R6

## Pirtûk bû mijara şanoyê


Pirtûka ku Gultan Kişanak li girtîgehê nivîsiye ya bi navê 'Rengê Mor ê Siyaseta Kurd' ji aliyê lîstikvana şanoyê Julide Kural ve li şanoya xwendinê tê lîstin. Tê plankirin ku lîstik di 27'ê kanûnê de bê lîstin...




ÇAND R6

## Pirtûkên 100 salên din

Li paytexta Norwêc Osloyê pirtûkxaneya pêşerojê tê ava kirin. Di pirtûkxaneyê de dê tenê pirtûkên ku piştî sed salan karibin bên xwendin, hebin. Pirtûkxane dê sala 2114'an li gel bê vekirin...



www.arsivakurdi.org



## Bi boneya daxuyaniyê ji xala 301’ê lêpirsîn vekirin

**MÊRDÎN -** Di çarçoveya çalakiyên 25’ê Mijdarê Roja Têkoşîna Li Dijî Tundiya Li Ser Jinan a Cîhanê endamên Platfroma Jinan a Şahmeranê ya Mêrdînê li ser destûrdayîna Qeymeqamiya Artuklû ya Mêrdînê daxuyanî hatibû dayîn. Endama Platformê Eylem Ergun li ser navê platformê daxuyanî xwendibû. Lê Serdozgeriya Komarê ya Mêrdînê der barê Ergun de bi hinceta daxuyanî xwendiye ji xala 301’ê lêpirsîn da destpêkirin. Hat zanîn ku lêpirsîn bi îdiaya ‘Propagandaya rêxistinê kiriye’ hatiye destpêkirin.

# Divê jin di siyasetê de cih bigirin

Rêvebera HDP’a Stenbolê Gonul Karaman der barê xebatên hilbijartina herêmî de axivî û diyar kir ku ew ê komîsyonên hilbijartinan li navend û navçeyan ava bikin. Karaman destnîşan kir ku divê jin di siyaset û rêveberiyên herêmî de cih bigirin û tev li xebatan bibin

HDP’a Stenbolê bi civîneke çapemeniyê starta xebatên hilbijartinê da. Derbarê xebatên hilbijartinan de rêvebera HDP’a Stenbolê Gonul Karaman axivî û diyar kir ku divê namzetên jin di rêveberiyên herêmî de çalak bin.

Karaman anî ziman ku divê krîtera esas a HDP’ê hebe û ew jî nîşandana polîtîkayên jinan a di nav şaredariyan de ye û wiha got: “Divê reng, fikir û gotin esas bê girtin û pirsgirêkên jinan bi rehetî bên çareserkirin. Me di demek nêz de li herêmên cuda civînên jinan pêk anîn. Jin naxwazin bikevin siyasetê. Divê jin rola li wan hatiye ferzkirin bişikînin û tev li siyasetê bibin. Em jî li ser vî esasî xebatan dimeşînin. Di serî de di rêveberiyên herêmî de, divê jin di siyasetê de cih bigirin û jin li dijî zîhniyeta serdest a mêr têbikoşin.”

Di berdewamê de Karaman daxuyand ku wan xebatên xwe yên ewil di nasandin û îmzekirina pirtûka Gultan Kişanak de kirine û bernameyên 25’ê Mijdarê jî xebatên wan ên ewil bûne. Karaman da zanîn ku ew xebatên xwe li ser teşwîqkirina namzetbûna jinan dimeşînin û wiha domand: “Bi giştî serlêdan di hefteyên dawî de zêde dibin. Em ê komîsyonên hilbijartinan li navend û navçeyan ava kirin. Stenbolê komîsyon ava kirin. Em ji bo hilbijartinê amade ne.”

Her wiha Karaman destnîşan kir ku HDP partiya jinan e û axaftina xwe wiha bi dawî kir: “Partiyên din ji bo jinan tişteki nakin. Partiya me jinê dide pêş. Em vê di mînakan de dibînin. Ya dengê jinan biriye meclisê HDP ye. Wê polîtîkayên li herêman jî di vî alî de bin. Em bang li hemû jinan dikin ku di HDP’ê de bibin namzet.” *STENBOL*




## Bi qeyûman demokrasî pêk nayê

Bijîşka diranan Zelal Yildirim Şen a ku beriya du salan bi KHK’ê ji kar hatiye îxrackirin, der barê hilbijartina herêmî de axivî. Şen da zanîn ku li dijî bêhiqûqî, îxrac û jikaravêtinê ev hilbijartin ji bo wan gelek girîng e.



Şen diyar kir ku piştî ew hatiye îxrackirin êrîşên derûnî jî li dijî wan zêdetir bûne û wiha got: “Ne tenê ez hemû kesên ku ji kar hatin avêtin û îxrackirin heman tiştî jiyan. Niha îktîdar û SGK dixwazin peymana me jî betal bikin. Îro gelek hevalên me piştî îxracbûn di karên cûda de dest bi xebatan kirin. Lê karê wan nebaş e. Dema ku dewlet tehemûlî wan neke dikare wan ji wî karê din jî derxîne. “

Di axaftina xwe de Şen bal kişand ser kiryarên qeyûman û anî ziman ku piştî qeyûm tayînê şaredariyan hatine kirin nêzî çar hezar kes ji kar hatine avêtin û wiha domand: “Dema qeyûm tayînî şaredariyan hat kirin vîna gel wê demê hat tunekirin. Bi qeyûman demokrasî ava nabe. Em bi demokrasiyê bawer in û ez bawer dikim ku di hilbijartinê de dê gelê me careke din bersivê bide qeyûman û kesên ku qeyûm tayîn kirine. Beriya ku qeyûm bê tayînkirin li Mêrdînê rewş gelek baş bû, komeleyên jinan hebûn û li mafên jinan xwedî derdiketin. Lê piştî qayûm rewş li Mêrdînê xira bû û hemû komeleyên jinan jî hatin girtin. Îro projeyên ku qeyûm çêkirine hemû yên şaredariya gel bûn. Lê qeyûm hat û dest danî ser hemûyan û wekî yên xwe nîşan dan. Divê em hemû bi hev re vî bajarî careke din ava bikin.”

Her wiha Şen got dê biheztir xebatên xwe bidomînin û da zanîn ku wan dev ji têkoşîna xwe berneda û dê bernedin jî. *MÊRDÎN*

## ‘Em dikarin gelek tiştan bikin’

Ji Tora Parastina Jinan Çagla Akdere der barê parastina cewherî de axivî û destnîşan kir ku parastina cewherî ya femînîst têkoşîneke topyekun dihewîne.

Akdere diyar kir ku parastina cewherî ne parastineke tenê li dijî şîdeta fizîkî ye û wiha got: “Dema nîqaşa parastina cewherî ya femînîst tê kirin bêguman parastinek ji bo çewisandina êrîşa fizîkî heye lê ev bi tena serê xwe têr nake. Ji ber tundiyê ne êrîşek ji nişka ve ya ji aliyê mêr pêk tê. Pergala serdest a mêr ji bo xwe heyî bike tundiyê diafirîne. Ev ne tenê fizîkî ye. Bi gelek teşeyan xwe nîşan dide. Divê li dijî vê têkoşînek topyekun bê nîşandan.”

Akdere destnîşan kir ku di nav parastina cewherî ya femînîst de, heta bê parastina fizîkî gelek rêbazên ku dikare bên kirin hene û got ku dema parastina cewherî ya femînîst rasterast wek alava parastina fizîkî bê dîtin, dê tundiya her tim xwe zêde dike jî neyê pêkanîn û axaftina xwe wiha bi dawî kir: “Dewlet bixwaze şertên xwe pêk anîbe parastina cewherî wek mafê rewa dibîne. Lê bi krîter û şertên diyarkirî vê biryarê dide. Ev jî dewlet çawa tundiyê dide nasîn nîşan dide. Dewlet tundiya psîkolojîk ji tundiyê hesab nake. Divê em darbeya li dijî tundiya fizîkî îspat bikin. Piştevaniya jinan gelek girîng e. Divê em fêr bikin û em bibin mamosteyên hev. Em dikarin gelek tiştan bikin û gelek rêbazên me hene.” *STENBOL*




## Girtî li ber çavên dayika wê derb kirin

Erîşên dermirovî yên dewleta tirk a faşîst yên li dijî girtiyan berdewam dikin. Hat zanîn ku girtiya bi navê Remziye Karadag li Girtîgeha bi Ewlehiya bilind a Xarpêtê li ber çavên dayika wê hate îşkencekirin.

Girtiya bi navê Remziye Karadag, 9 meh berê ji Girtîgeha Jimara 2 ya Tîpa T ya Rihayê sewqî Girtîgeha bi Ewlehiya Bilind a Xarpêtê hat kirin. Dayika Karadag, Fîdan Karadag ji bo hevdîtinê çû Xarpêtê. Dayik Karadag têkildarî hevdîtinê axivî û da zanîn ku dema wê hevdîtin bi keça xwe re dikir, keça wê û du hevalên wê ji aliyê gardiyanan ve hatine derbkirin.

Dayik Karadag destnîşan kir ku keça wê jî ji bo rakirina tecrîda girankirî ya li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan di 27’ê mijdarê de ketiye çalakiya greva birçîbûnê ya ku girtiyên PKK û PAJK’î daye destpêkirin û wiha got: “Divê em bi her awayî xwedî li wan derkevin. Ez banga hestiyariyê dikim ku her kes xwedî li girtiyan derkeve.” *RIHA*



## Jinan qala wêrankirina bajarê xwe kir

Dewleta tirk, di çarçoveya ‘Plana Têkbirinê’ de ji Kanûna 2015’an û pê ve êrîş bi ser bajarên kurdan. Bi qedexeyên derketina derve û dorpêçkirina bajaran re bajar hatin hilweşandin, bi sedan mirovî jiyana xwe ji dest da, bi sedhezaran kes jî neçar man koç bikin. Komeleya Şopandina Koçberiyê (Goç-Îz) koçberiya bi darê zorê ya piştî dorpêçiya salên 2015-2016’an rû da, li ser çîrokên şexsî yên jinên koçberkirî, di pirtûka ‘Çîrokên Koçberiyê yên Jinan’ de vegot.

Di pirtûkê de tê ragihandin ku ev koçberî ji ya salên 90’î cudatir e, ji ber ku vê carê mirovan koçî metropolên Tirkiyeyê nekirin, koçî bajar û navçeyên derdora xwe kirin. Sedema vê yekê jî hêviya vegera di zûtirîn demê de ye.




Di pirtûkê de bi kurtasî qala bûyerên di salên 2015-2016’an de qewimîne tê kirin û tê gotin ku di nava salekê de 500 hezar mirov bi zorê ji cih û warên xwe hatine derxistin û hejmara mirovên ku van bûyeran bandor li wan kiriye gihîştiye milyonek û 671 hezarî. Li gorî daneyên Navenda Dokumantasyonê ya TÎHV, ji 16’ê tebaxa 2015’an heta 16’ê tebaxa 2016’an tenê di dema qedexeya derketina derve de herî kêm 321 sivîl hatine kuştin.

Ji bo amadekirina pirtûka ‘Çîrokên Koçberiyê yên Jinan’, li Nisêbîn, Cizîr, Şirnex, Gever, Sûr û Wanê hevdîtin bi 47 jinan re hate kirin lê belê ji ber gelek sedeman di pirtûkê de tenê çîrokên 18 jinan hatine vegotin. Wekî din, gelek nav û agahiyên li ser cihê lê ne ji ber ewlekariyê hatine guhertin. *STENBOL*

## Sedemên tundiya li dijî jinan hat gotûbêjkirin

Di çarçoveya pêngava 16 rojî ya têkoşîna li dijî tundiya li ser jinê li Koleja Yasa ya Zanîngeha Silêmaniyê ji aliyê Navenda Lêkolînên Yasayî û Siyasî ve komxebateke 2 rojan pêk hat. Komxebat li ser sedemên tundiya li ser jinê û rêyên wê yên têkoşînê bû. Di çarçoveya komxebatê de gelek panel û semîner hatin dayîn.

Di komxebatê de axaftvanan diyar kir ku tundî hem di warê fizîkî de hem jî di warê derûnî de li ser bedena jin çêdibe û got ku divê kesên van tundiyan dikin bên cezakirin.

Her wiha di komxebatê de axaftvanan bal kişand ser zewacên di temenên biçûk de pêk tê û wiha gotin: “Di temenê biçûk de zewicandin dibe sedema pirgirêkên tenduristî û xerabbûna derûniya jin û mêran.” *SILÊMANÎ*



# Jinên Minbicê bi melkisan çanda hilberînê didomînin



Çanda çêkirina melkisan (sivnik, gêzik) a ku ji dîrokê heta niha bi destên jinan domiyaye niha li Minbicê jî ji aliyê jinan ve berdewam dike.

Jina bi navê Niweyla Hecî ku bi destê xwe melkisan çêdike diyar kir ku ew heta niha bi kedek mezin û dilxwazî çanda çêkirina melkisan domandiye û wiha got: “A herî kêfa min jê tê jî ev e ku ez çêkirina melkisan hînî jinên derdora xwe jî dikim. Dema ku kesên nû hîn bibin dê çanda çêkirina melkisan jî bi dawî nebe.”

Hecî anî ziman ku tiştên kevnar her dem moral dide mirovan û wiha domand: “Ji ber ku heta vê rojê min çanda xwe parastiye li gor min mîrateya herî girîng ev e. Min her çar keçên xwe jî hînî vê çandê kir. Berê çêkirina melkisan bêtir dijwar bû. Lê niha ji ber makine derketiye ez hêsantir çêdikim. Ez di heman demê de dema melkisan difroşim debara xwe jî dikim. Ez bi vî awayî alikariya cîranê xwe jî dikim.”

Her wiha Hecî da zanîn ku dema kesek dixwaze fêrî çêkirina melkisan bibe ew alîkarî dide wan û axaftina xwe wiha bi dawî kir: “Ev çanda ku bi salan e didome, berdewamkirina wê ji bo min bextewarî ye.” *MINBIC*

# Gelê kurd dê bi ser bikeve

Hevseroka HDP'ê Pervîn Buldan beriya ku bi 9 parlamenteran re li dijî tecrîdê li meclisê dest bi çalakiya greva birçîbûnê bikin, di civîna hefteyê de axivî. Buldan diyar kir ku dê gelê kurd bi çalakiyên xwe tecrîdê têk bibe û got ku gelê kurd dê vê carê têk neçe

Hevseroka Partiya Demokratîk a Gelan (HDP) Pervîn Buldan beriya ku bi 9 parlamenterên HDP'ê re li meclisê li dijî tecrîdê bikeve greva birçîbûnê ya 3 rojan, di komcivîna hefteyê de axivî. Buldan gelemperiya axaftina xwe ji tecrîda girankirî ya li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan re veqetand.

Buldan diyar kir ku li her qadê pirsgirêk û krîzên cidî hene û wiha got: "Desthilatdariya AKP-MHP-Qesrê welat aniye ber têkçûnê. Tecrîdkirina birêz Ocalan ku 3 sal in bê navber bi tundî tê kirin, bêguman pêwendiya xwe bi vê pêvajoya tarî re heye."

**Mesele tecrîdkirina şexsekî nîne**

Di axaftina xwe de Buldan da zanîn ku mesele tecrîdkirina şexsekî nîne û wiha domand: "Girtina deriyê Îmraliyê, derba li dijî tevahiya welêt e, li dijî demokrasî, edalet û îradeya jiyana bi hev re ye. Bi girtina wî derî re welat bi temamî hatiye girtin. Li Îmraliyê hêvî û pêşeroja gelan hatiye tecrîdkirin. Em dixwazin bi bîr bixînin; di kompoloya 15'ê Sibatê de ceribandin, lê birêz Ocalan komplo pûç kir. Niha jî AKP bi desteka hêzên navneteweyî û bi rêya tecrîdê dixwaze komploya xwe ya 15'ê Sibatê bixe dewrê."

Buldan bi bîr xist ku ev sê sal in li dijî gelê kurd lîstikeke navneteweyî tê lîstin û destnîşan kir ku ev lîstik xwe li Kerkûk û Efrînê nîşan daye û wiha pê de çû: "Bi lîstêkên bi vî rengî dixwazin kurdan sedsaleke din bê statu bihêlin. Birêz Ocalan yekane lîder e ku dikare vê lîstikê têk bibe. Birêz Ocalan kesayetekî girîng e, têkoşerek e, ramangerekî girîng e û lîderekî dîrokî ye ku dikare çarenûsa Tirkiyeyê û Rojhilata Navîn biguherîne."

**Dîroka berxwedanê mezin e**

Di dawiya axaftina xwe de Buldan destnîşan kir ku ew lîstika mezin a hêzên hegomonîk dibînin û wiha bi dawî kir: "Zanibin ku kurd dê ji rêya xwe venegerin û teslîm nebin. Birêz Ocalan 19 sal in li Îmraliyê li ber xwe dide. Hûn ê li tu cihî nikaribin pêşî li meşa gelê kurd bigirin. Bila dîrok şahid be; ev lîstik teqez dê têk biçe. Ger di nava osmaniyan de dek û dolab gelek bin, dîroka gelê kurd jî dîroka berxwedanên mezin e. Di dîrokê de tu carî zalim bi ser neketine, her tim berxwedêr bi ser ketine. Hûn çi dikin bikin, hûn ê nikaribin rêveçûna dîrokê biguherînin. Kurd dê vê carê têk neçin."

**Piştî civînê dest bi çalakiyê kirin**

Her wiha piştî civînê Pervîn Buldan û 9 parlamenterên HDP'ê Berdan Ozturk, Mîthat Sancar, Dîlan Dirayet Taşdemîr, Kemal Bulbul, Şevîn Coşkun, Serpîl Kemalbay, Habip Eksik, Zuleyha Gulum û Erdal Aydemir ji bo sê rojan li meclisê ketin greva birçîbûnê. *ENQERE*




## 'Em û zarokên xwe dê bi hev re tecrîdê bişikînin'



Bi armanca şikandina tecrîda girankirî ya li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, girtiyên PKK û PAJK'î ji bo 10 rojan dest bi çalakiya greva birçîbûnê ya bêdem û dorveger kir. Çalakiya girtiyên siyasî di roja 9'emîn de berdewam e. Malbatên ku zarokên wan di girtîgehên li herêma Egeyê de ne, bi rêya telefonê hevdîtin bi zarokên xwe re kirin û gotinên wan ên dawî par ve kirin.

Yek ji van malbatan jî malbata Abdullah Poyraz e. Çar zarokên Poyraz di girtîgehê de ne. Ji kurên wî 2 li Girtîgeha Şakran a Alîaga ya Îzmîrê û 2 jî li Girtîgeha Kepsûtê ya Balikesîrê dimînin. Apê Abdullah destnîşan kir ku her çar zarokên wî jî di greva birçîbûnê de ne û wiha got: "Zarokên me li hundur, em jî li derve têdikoşin. Divê herkes dengê xwe bilind bike û tev li çalakiyê bibe."

Bavê girtiyê bi navê Savaş Ozer ku li Girtîgeha Tîpa A ya Jimar 1 a Kiriklarê dimîne, Vasfî Ozer jî wiha got: "Bi rêya telefonê bi kurê xwe re axivîm. Got ku ew tecrîdê qebûl nakin û ger dewlet daxwaza wan qebûl neke, dê dest bi greva birçîbûnê ya bêdorveger bikin. Em piştgiriyê didin zarokên xwe. Zarokên me li hundir û em jî li derve têdikoşin."

**'Dewlet ji berxwedanê ditirse'**

Yek ji girtiyên ku ji bo rakirina tecrîdê ketiye greva birçîbûnê jî Yîgît Uste yê ku li Girtîgeha Tîpa R ya Menemenê tê girtin e. Der barê mijarê de bavê Uste, Harbî Uste da zanîn ku kurê wî gotiye ger tecrîd ranebe dê çalakî belav bibe û diyar kir ku dewlet ji berxwedana girtiyan û gelê kurd ditirse. *ÎZMÎR*

## Li gelek bajaran çalakî dest pê kirin

Hevseroka Kongreya Civaka Demokratîk (KCD) û parlamentera HDP'ê ya Colemêrgê Leyla Guven a li Girtîgeha Tîpa E ya Amedê girtî ye, li dijî tecrîdkirina Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan 28 roj in di çalakiya greva birçîbûnê de ye. Piştevaniya ji bo çalakiya Guven her roj pêl bi pêl berbelav dibe. Di çarçoveya van piştgiriyan li gelek bajarên wek Mêrdîn, Riha, Êlih, Şirnex û Stenbolê parlamenterên HDP'ê û welatî dest bi çalakiya greva birçîbûnê kirin. Beriya destpêkirina çalakiyê daxuyanî hatin dayîn û di daxuyaniyan de hat gotin ku daxwaza Guven daxwaza wan e û xwestin ku demildest tecrîda li ser Ocalan bê rakirin. Her wiha çalakiya greva birçîbûnê ku li Amed û Mêrsînê hatibû destpêkirin jî hêj didome. *AMED*



## Li Îtalya û Kanadayê çalakiya Leyla Guven hat silavkirin

Çalakiyên greva birçîbûnê yên ji bo protestokirina tecrîdkirina Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan li her derê cîhanê didomin.

Li paytexta Îtalya Romayê ji bo şermezarkirina tecrîdê û biryara Amerîkayê ya li hemberî sê pêşengên PKK'ê Mûrat Karayilan, Cemîl Bayîk û Dûran Kalkan greva birçîbûnê ya sê rojan dest pê kir.

Her wiha greva birçîbûnê ya bi heman armancê li bajarê Toronto yê Kanadayê bi pêşengiya Meclisa Gelê Kurd a Demokratîk hatibû destpêkirin jî didome. Der barê çalakiyê de kurdistaniyên ku daxuyanî da, tecrîdê şermezar kirin û çalakiya Guven ji silav kirin. *BRUKSEL*



## Partiyên Başûr piştgirî dan greva birçîbûnê ya HDP'ê




Nûnertiya HDP'ê li Hewlêrê bi armanca rakirina tecrîda li ser Ocalan û piştgirîdayîna çalakiya Leyla ev 15 roj in greva birçîbûnê dane destpêkirin. Di vê çarçoveyê de nûnerên Hizba Zehmetkêşanî Kurdistanê û Bizûtnemeweyî Demokrasî ya Gelê Kurdistanê jî serdana çalakgeran kirin û piştgirî dan.

Her wiha hunermendên başûrê Kurdistanê jî ji bo azadiya Ocalan banga yekitiya neteweyî kirin û gotin ku divê her kes li dijî tecrîdkirina Ocalan dakeve qadan, kar û xebatan bimeşîne. *HEWLÊR*

## Dadgehê cezayê Demîrtaş û Onder erê kir

26'emîn Dadgeha Cezayên Giran a Stenbolê li hevserokê HDP'ê yê berê Selahattîn Demîrtaş û parlamenterê HDP'ê Sirri Sureya Onder bi îdiaya 'propaganda rêxistina çekdarî kiriye' ceza birîbû. Dadgehê li Demîrtaş 4 sal û 8 meh, li Onder jî 3 sal û 6 meh cezayê girtîgehê birîbû. Parêzeran li ceza îtiraz kiribû. Lê 2'yemîn Daîreya Ceza ya Dadgehên Edliyeya Herêmî ya Stenbolê cezayê ku li Demîrtaş û Onder hatibû birîn erê kir. *STENBOL*




## Şervanan hezar û 200 sivîl ji DAIŞ'ê rizgar kirin

Şervanên HSD'ê di çarçoveya qonaxa Şerê Tunekirina Terorê ya Pêngava Bagera Cizîrê de rojane derbên giran li çeteyên DAIŞ'ê dixin. Şervanên ku pêngav bi pêngav herêmê ji dagirkeriya çeteyên DAIŞ'ê rizgar dikin, sivîlên herêmê jî rizgar dikin û derbasî herêmên bi ewle dikin. Li gorî çavkaniyeke leşkerî ragihand ku di encama şer û pevçûnên giran de, hezar û 200 sivîl din jî ji çeteyên DAIŞ`ê hatine rizgarkirin. *DÊRAZOR*



## Projeyên Taş, Parastin û MÎT'ê yên li dijî PKK'ê



Ji rêveberên MÎT'ê yên di destê HPG'ê de girtî ye, Aydin Gunel têkildarî planên Nîzamettîn Taş ên bi hevkariya MÎT'ê yên li dijî PKK'ê agahiyên girîng dan. Gunel destnîşan kir ku di sala 2017'an de bi Taş re hevdîtin hatine kirin û serokê Daîreya Operasyonê ya MÎT'ê Mehmet Levent Turkgucu û serokê Daîreya Koordînasyonê ya MÎT'ê Yûsûf Serkan Paksoy jî tev li van hevdîtinan bûne û 'karê ji bo avakirina partiyeke li dijî PKK'ê' hatine nirxandin.

Gunel destnîşan kir ku Taş serkêşê wan kesan e ku dixwazin li bakurê Kurdistanê li dijî Tevgera Azadiyê partiyeke alternatîf ava bike û wiha domand: "Nîzamettîn Taş ku koda wî Botan e, ji me re got ku dixwaze hevdîtinê bike. Daxwaza hevdîtinê bi rêya Rêxistina Îstîxbaratê ya PDK'ê (Parastin) kir. Parastinê ev daxwaz bi rêya Konsolosxaneya Erbîlê ji Musteşariya MÎT'ê re ragihand. Li ser vê yekê, di adara 2017'an de tevî serokê Daîreya Operasyonê ya MÎT'ê Mehmet Levent Turkgucu, em hatin Erbîlê û li avahiya Parastinê ya li Selahaddînê bi Nîzamettîn Taş re rûniştin. Di hevdîtinê de berpirsyarê maseya PKK'ê ya Parastinê Salih Barzanî, nûnerê MÎT'ê yê Erbîlê Selçûk Şenel û tercûmanek jî amade bûn."

**Plana avakirina partiyekê**

Gunel got ku Taş di hevdîtinê de nêrînên xwe yên li ser bûyerên li herêmê diqewimin anîne ziman û wiha pê de çû: "Got ku dixwazin li Tirkiye û bakurê Kurdistanê, partiyeke ku bibe 'Alternatîfa PKK'ê' ava bikin û piştgirî xwest. Veqetîna xwe ya sala 2004'an a ji nava PKK'ê bi bîr xist û da zanîn ku bi Osman Ocalan û Hidir Sarikaya re rêxistineke bi navê PWD'ê ava kirine lê têk çûne. Got ku ev 13 sal in di bin kontrola PDK'ê de dem derbas dikin û got; 'Em dixwazin bi partiyên Hak-Par, PAK û PWD'ê re kom bibin û li Tirkiyeyê partiyeke legal ava bikin.'"

Guney got ku Taş di berdewamê de jî gotiye; 'Armanca vê partiyê, şikandina bandora PKK'ê ya li herêmê ye. Gelek eşîr û malbatên cerdevanan hene ku destekê didin me. Beşek ji kadroyên di salên damezirandina PKK'ê de amade bûn, bi me re ne. Em ê li Tirkiyeyê karê rêxistinbûnê bikin û hewl bidin xwendekarên zanîngehan ber bi xwe ve bikişînin. Ji bo vê jî alîkariya MÎT'ê lazim e. PDK alîkariya madî dide me.'

**Burkay jî proje bû û têk çû**

Herî dawî jî Gunel ev agahî parve kir: "Ez jî di van hevdîtinan de amade bûm. Lê ji ber ku em hatin girtin, ev hevdîtin nîvco man. Ez nizanim niha çi pêk hatine. Ji bo avakirina partiyeke ku bibe alternatîfa PKK'ê tim xebat hene. Mînak, Kemal Burkay bi dahol û zirneyê anîn Tirkiyeyê. Armanc ew bû ku bibêjin; 'Vaye alternatîfa PKK'ê heye û kurdên me êdî hene.' Lê ew jî têk çû."

**Fînansor MÎT bû**

Berpirsê din ê MÎT'ê Erhan Pekçetin jî li ser heman mijarê got ku ew jî hevdîtinê agahdar bûne û wiha axivî: "Serok Serkan xwest ku em partiya ku nû ava dibe bişopînin. Serok Lewent jî ji bo partiya ku wê nû were avakirin behsa 300 hezar dolarî dikir. Ji bo partiya nû evqas pere difikirîn." *BEHDÎNAN*

www.arsivakurdi.org



## Îranê gefên nû li Amerîkayê xwarin

**TEHRAN -** Serokê Îranê Hesen Rûhanî li ser televîzyona fermî ya Îranê ragihand ku divê Amerîka bizane ger Îran petrola xwe hinarde neke dê tu dewlet nikaribin petrola Kendavê jî wergirin. Berpirsyarên Amerîkayê got ku ew li ser biryara ku hinardeya petrola Îranê bigihînin sifirê bi israr in da ku projeya nukleerî û destdirêjiyên li herêmê rawestin. Hêjayî bibîrxistinê ye ku sepanên Amerîkayê li ser hemû beşên aborî, darayî û endustrî ne û bi taybetî di serî de li ser beşa petrolê ne ku ew jî bingeha aboriya Îranê ne. Sepanên Amerîkayê yê ji bo petrola Îranê di mijdara 2018'an de ketin meriyetê.





# Hikûmeta Fransayê paş de gav avêt

Çalakiya 'Êlek Zer'an a li dijî polîtîkayên hikûmetê û bi krîza biryara zêdekirina baca sotemeniyê ku bi hefteyan e didome encam girt. Serokwezîrê Fransayê Edourd Phîlîppe got ku mafê tu bacê tune li ser yekitiya neteweyî metirsiyê çêbike

Çalakiyên 'Êlek Zer'an ku 17'ê mijdarê li dijî zêdekirina bihayê sotemeniyê dest pê kir, du hefteyên dawî li Parîsê û gelek bajarên din bû rojeva sereke. Heta niha 2 kes mirine, bi sedan kes birîndar bûne û bi hezaran kes jî ketin ber lêpirsînê.

Çalakiyên 'Êlek Zer'an ku bi hefteyan e dewam dike niha jî kedkarên çandiniyê dest bi xwepêşandanan kir. Hikûmeta ku bêçare maye, guhertina mafê xwepêşandanê xist rojeva xwe.

Serokwezîr Edouard Philippe ji bo sekinandina krîza ji ber çalakiyên 'Êlek Zer'an wê daxuyaniyê bide ku ew ê bihakirina sotemeniyê ya ku ew ê di 1'ê çileyê de têketa meriyetê bidin sekinandin. Li gorî medyaya Fransayê wê serokwezîr vê sêşemê biryara hikûmetê aşkera bike. Bi sekinandina bihakirina sotemeniyê ji bo sekinandina çalakgeran ew ê tevdîrên din jî werin stendin.

Bi sedan kedkarên çandiniyê duh li ber walîtiya bajarê Eure-et-Loîrê li hev civiyan û kevirên ku xistibûn traktorên xwe, li ber avahiya walîtiyê rijandin. Li ser çalakiyê daxuyaniyek hate dayîn û hate gotin ku polîtîkayên Serokkomar Emmanuel Macron, kedkar li bin guhê dîwêr xistine û ji ber vê yekê wan dîwarê ji kevir li ber walîtiyê çêkiriye. Li paytext Parîsê, ambûlansek li ber Meclisa Neteweyî hate şewitandin.

Hikûmeta ku guh nade daxwazên 'Êlek Zer'an, dixwaze mafê xwepêşandanê kêm bike. Duh li Qesra Elyseeyê bi beşdariya Wezîrê Karên Hundir Christoph Castener û gelek wezîrên din civîneke bilind li ser krîzê hate kirin. Daxuyaniyên piştî civînê hatin dayîn di vê çarçoveyê de ne.

Sekreterê dewletê yê li Wezareta Karên Hundir Laurent Nunez diyar kir ku tenê roja şemiyê 412 kes hatine destgîrkirin û got, heta niha di tu çalakiyê de ewqas kes nehatine destgîrkirin. Nuner ragihand, li ser mafê civîn û xwepêşandanê komeke xebatê hatiye avakirin û got ku ji sala 2019'an û pê ve dibe ku astengiyên cidî bikevin rojevê.

Yek ji pêşniyarên sereke yên koma xebatê pêşkêş kiriye; li derdora qada xwepêşandanê xelekek berfireh a parastinê bê avakirin, destûr ji kesên 'gumanbar' re neyê dayîn ku tev li çalakiyan bibin û pêçandina rûyê xwe di xwepêşandanê de 'sûc' bê dîtin.

**Xwestin çalakî bi dawî bibe**

Wezîrê Karên Hundir Christoph Castaner jî xwest, xwepêşandanên 8'ê kanûnê yên li gelemperiya welêt li dijî germbûna global werin lidarxistin, bên betalkirin. Castaner 'Meşa ji bo Avhewayê' wê bi banga 60 komele û saziyan li 140 bajarên cuda bên organîzekirin û bang kir ku ev çalakî bên betalkirin. ***PARÎS***

## Îsraîlê dest bi pêngava **'Mertala Bakur'** kir

Artêşa Îsraîlê li ser sînorê bakur bi Lubnanê re dest bi operasyona leşkerî ya li dijî tunelên Hizbullahê kir. Artêşa Îsraîlê pêngava xwe bi "Mertala Bakur" bi nav kir. Pêngav bi fermandariya Yaûl Sitirêk tê birêvebirin û 'tîmên taybet û hevbeş ên Desteya Istixbaratê û fermandariya bakur û çekên endeziyarî' beşdar bûne.

Li gorî daxuyaniyê, Desteya Artêşa Îsraîlê ji sala 2014`an ve amadekariya vê pêngava leşkerî ku gelek hêzên mezin jî beşdarî pêngavê dibin, dike. Desteyê ragihand ku gelek herêmên nêzî dîwarê bi ewle li bakurê herêmên leşkerî, girtî ne.

Di daxuyaniyê de hate gotin ku artêşa Îranê piştgiriya kolandina tunelên Hizbulllah a terorîst dike da ku li dijî welatiyên Îsraîlê bide bikaranîn. Îsraîl kolandina tunelên Hizbulllahê weke binpêkirina aşkera ya serweriya Îsraîlê bi nav dike ku rasterast gefan li welatiyan dixwe. Di daxuyaniyê de hat gotin ku tişta ku di hundirê xaka Lubnanê de pêk tên berpirsyariya artêşa Hikûmeta Lubnanê ye û hat gotin ku hebûna tunelan nîşan dide ku artêşa Lubnanê li wan herêman bi berpirsyariya xwe ranabe. ***QUDS***




## Dîwarê DYA'yê derbas kirin

Gelek koçberên ku li ser sînorê Meksîka û DYA'yê bûn, li gel xetereya ku werin girtin, dîwarê di navbera her du welatan de derbas kirin. Ji serê meha cotmehê û vir ve bi hezaran koçberên ji Amerîkaya Navîn berê xwe dabûn DYA'yê. Serokê DYA'yê Donald Trump ji bo sekinandina koçberan artêş peywirdar kiribû.

Trump hewl dabû ku prosedura îlticakirinê bide guherandin ku tê de tê diyarkirin ku heta îltica were kirin divê koçber li Meksîkayê bin. Lê vê projeya reformê ji aliyê dadgehên Amerîkayê ve hate redkirin.

Koçberên ku westiyane, li kampên Tîjûanayê ne. Gelek koçberan hewl da ku roja duşemê dîwar derbas bikin. Li gorî nûçegîhanê Reûtersê gelek koçberan dîwarê ku 450 metre dûrî Okyanûsa Pasîfîkê ye derbas kiriye. Koçber ji bo derbaskirina dîwarê ku bi 3 metreyan stûr e, li cihekî kort ê ku dîwar nizm dibe, dîwar derbas kirine. Hate ragihandin ku sê kesan xwe gihandiye peravê û ji aliyê polîsan ve hatine destgîrkirin. Tê payîn ku bi ketina tariyê ya erdê re komên qelebalix ên ku gelekê wan zarok in, dîwar derbas kirine. ***TÎJÛANA***



## Ciwan dengê xwe nadin desthilatdariyê

Li Almanyayê, şîrketa bi navê Civeyê ji Spiegel Online re anketek amade kir. Li gorî vê anketê heke îro hilbijartin pêk were wê partiyên Koalîsyonê Partiyên Yekîtiya Xiristiyanan CDU-CSU û Partiya Demokratên Sosyal (SPD) ji sedî 41'yê dengan ancax karibin bigirin. Dengên CDU-CSU'ê ji sedî 26,5 ye û yê SPD tenê ji sedî 15 yê dengan e.

Li gorî heman anketê Partiya Keskan a Almanyê a mixalefetê (Die Grunen) ji sedî 19,9 di rêza duyemîn de ye. Partiya rastgir a radîkal a Alternatîf ji bo Almanyê (AfD) jî ji sedî 15,9 partiya sêyemîn e û SPD'ê derbas dike.

Li gorî anketa Spiegel Onlineyê dengê partiya mixalefetê Partiya Azad a Demokrat (FDP) ji sedî 9,5, Partiya Çep (Die Linke) ji sedî 9,4 deng digirin.

**Rêjeya dengan a li gorî temenan**

Mijareke din a balkêş jî di der barê rêjeya dengan a li gorî temen e. Li gorî vê, koalîsyona CDU-CSU di nav kesên ji ser 65 salî ji sedî 37,7, SPD ji sedî 18,8 deng digire.

Partiyên desthilatdariyê li tevahiya welêt dengên ciwanan kêm digirin. Di nav hilbijêrên temenê wan di navbera 18 û 49'an de rêjeya dengên desthilatdariyê tenê ji sedî 33 ye. CDU-CSU ji sedî 19,7 rêjeya herî kêm ji hilbijêrên temenê wan 18-29'an werdigirin. SPD jî rêjeya dengê xwe ya herî kêm di nav hilbijêrên temenê wan di navbera 40-49'an de ji sedî 11,2 werdigire. ***BERLÎN***



## Ji bo girtiyan peyman hate îmzekirin


Li Yemenê ku şerekî giran lê heye di navbera hêzên hikûmetê û çekdarên hûsî de ji bo guherandina girtiyan peymanek hate îmzekirin. Hadi Beg ê ku bi girtiyan re eleqedar dibe ji AFP'ê re axivî û diyar kir ku li ser 1500-2000 hêzên hikûmetê û 1000-1500 çekdarên hûsî peyman hatiye îmzekirin.

Rêxistina Xaça Sor a Navneteweyî jî bi daxuyaniyekê peyman silav kir. Ev peyman beriya destpêkirina hevdîtinên aştiyê pêk hat ku tê payîn li Swêdê were lidarxistin. Tê gotin ku dê danûstandin di 5'ê kanûnê de were destpêkirin.

Di adara 2015'an de milîsên hûsî yên şîa Sana bi dest xist. Di vî şerê navxweyî de yê ku Erebistana Siûdî jî ketiye tê de ye, heta niha herî kêm 10 hezar kesên sivîl mirine. Di çar salên dawî de bi hezaran kes jî ji ber nexweşiyan mirine. Li gorî NY'ê li welat ji gelheya 28 milyonî 14 milyon di sînorê birçîbûnê de ye. Alîkarê sekreterê giştî yê NY'ê yê ji karên mirovî berpirsyar Marck Lowcock, di demek berê diyar kiribû ku 'karesateke mezin' li pêşiya Yemenê ye. ***SANA***



## Li Îranê ji sedî 60'ê xwedekaran bê kar in



Rêvebirê Zanîngeha Karbûr a Îranê Ehmedreza Pêşbîn, aşkera kir ku zêdetirî 100 hezar kesên xwedî dîplomya bijîşkiyê ne li Îranê bê kar in. Her wiha li gorî daneyên fermî ji sedî 60'ê xwendekarên zanîngehan jî bê kar in.

Ehmedreza Pêşbîn diyar kir ku salane li Îranê 3 hezar kes ji bo xwendina bijîşkiyê tên wergirtin û dibin xwediyê dîplomayê. Pêşbîn aşkera kir ku ev rêjeya wergirtina kesên ji bo xwendina bijîşkiyê piştî Rusya û Amerîkayê rêjeya herî bilind e. Her wiha Pêşbîn bal kişand ser asta zanîngehên Îranê di aliyê zanistî de û ev agahî parve kir "Ji sedî 90'ê zanîngehên Îranê bê kalîte ne. Ji bo vê pêwîst e bernameyek pêşketî û bi kalîte ji bo zanîngehan were amadekirin." Li gorî daneyên fermî yên Îranê ji sedî 60'ê xwendekarên ku zanîngeh qedandine bê kar in. ***TEHRAN***

www.arsivakurd.org

Kirmanckî

5 Kanûne 2018 Çarşeme



## Heta ke waştişê ma nêrî ca ma fek vera nêdanî

**STENBOL -** Qezaya Avcilarî ya Stenbolî de 83 karkerê cinî yê ke Fabrîkaya Dermanan ya Grîpînî de xebetîyayêne 8 rojî yo ke grev de yî. Karkerî dîyar kerdî ke heta ke waştişê înan nêrî ca ê fek grevê xo ra vera nêdanî û çalakîya înan do dewam bikera. Karkeran ra Şîrîn Akay, Çîgdem Yahşîya ke 20 serrî yo fabîrka de xebetîyena û Hanîfe Çerkezogluye bale antî grevê xo ser û dayî zanayene ke ê bawer nêkenî ke rotiş kêmî bîyo, çimkî Tirkîye de tena Fabrîkaya Grîpînî grîpîn roşeno û şar tena hetê weşî de kêmanîyan nêdano xo.



# Çalakîya Leyla Guvene qîrayîşêk a

Parlamenteranê HDPyî yê Amedî dayî zanayene ke çalakîya Leyla Guvene hemverê tecrîdî de qîrayîşêk a û ganî no qîrayîş bêro eşnawitene û vatî: “Tecrîd bi usûlanê cîya cîyayan yeno xorî kerdene. Rolê Ocalanî zaf muhîm o. Çalakîya Guvene qîrayîşêk a û ganî bêra eşnawitene.”

Hemsereka Kongreya Komela Demokratîke (KCD) û parlamentera Partîya Demokratîke ya Şaran (HDP) ya Colemêrgî Leyla Guvene seba wedarnayîşê tecrîdê serê Rayberê Şarê Kurdî Abdullah Ocalanî 8ê teşrîna peyêne de grevê vêşanîye daye dest pêkerdiş û çalakîya Guvene ewro roja 28. de dewam kena.

Her hetê Kurdistan, Tirkîye û Erwopa ra piştî dîyena çalakîya Guvene û Amed de zî seba paştîdayîşê çalakîya Guvene grêve vêşanîye ame dest pêkerdene.

Parlamenterê HDPyî yê Amedî Selçuk Mizrakli, Dersim Dage, Semra Guzele û Musa Farisogullari yê ke grêve vêşanîye de yê derheqê tecrîdo giranerde, çalakîya Leyla Guvene û hêrişê polîsan ser o qisey kerdî.



Dersim Dag · Selçuk Mizrakli · Semra Guzel · Musa Farisogullari

**Rolê Ocalanî zaf muhîm o**

Selçuk Mizrakliyî qiseykerdişê xo de bale ant muhîmîya rolê Ocalanî ser û va: “Seba çareserkerdişê meseleya kurdî û hewlîya Tirkîye tecrîdê serê Birêz Ocalanî ganî ca de bêro wedartene. Wextê prosesê aşîtîye de her kesî dî ke rolê Ocalanî zaf muhîm o. Coka çalakîya Guvene qîrayîşêk a û ganî hetê her kesî ra bêra eşnawitene.”

**Nêeşkenî xoverdayîşê ma bişiknî**

Semra Guzele zî vist vîrî ke verê weçînayîşanê cayîyan hêrişê serê partîya înan zêdîyayî û va: “Dewlete bi nê hêrişan hêtek ra zî wazena ke tecrîdî bido vîrakerdene. Bi nê hêrişan wazenê ke şar verê înan de çok bido ro la ma verê zext û hêrişanê înan de milê xo çewt nêkenî. Ê rixmê heme hêrişan nêeşkenî xoverdayîşê ma bişiknî.”

**Bi usûlanê cîyayan tecrîdî xorî kenî**

Musa Farisogullari zî waşt ke tecrîdo girankerde ke serê Ocalanî de yeno domnayene ca de bêro wedartene û wina domna: “Tecrîdo ke 19 serrî yo dewam keno 3 serranê peyênan de bi usûlanê cîya cîyayan yeno xorîkerdene. Çalakîya Guvene heqêko fermî û demokratîk o. Hukmat ganî goş bido nê vengdayîşî û nê waştişanê meşrûyan qebul bikero.”

**Çalakîyê ma do bêrî vilakerdene**

Dersim Dage zî hêrişê polîsan ê serê çalakwanan ê Mersînî vist vîrî û va: “Ma 5 bajaran de dest bi grevî kerdbi. La hêrişê polîsan ê Mersînî ra dima heme bajaran de vera hêrişê polîsan û paştîdayîşê Guvene qerarê çalakîyan ame girewtene. Çalakîyê ma do bi vilabîyayîşî dewam bikerî. Ma reyna vanî waştişê Guvene waştişê ma pêrunan o.” ***AMED***

## Hildesheîm û Toronto de grevê vêşanîye

Destpêkerdişê grevê veşanîye yê Leyla Guvene ra dima teberê welatî de zî çalakîyî û grevê veşanîye dest pêkerdî. Bajarê Hildeshêîmî yê Almanya û bajarê Toronto yê Kanada de semedê vervindertişê tecrîdî grevê veşanîye ame despêkerdene.

Kurdanê Hildesheîmî yê bajarê Almanya qey 5 rojan dest bi grevê veşanîye kerd.

Cayê Dîe Lînkeyî yê Hildesheîmî de qey 5 rojan grevêkê veşanîye dest pêkerd ke mîyanê grevkerdoxan de wekîla HDPyî yê verînan ra Leyla Bîrlîke zî est a. Grevkerdoxan eşkera kerd ke; “Waştişê Leyla Guvene waştişê ma û waştişê bi mîlyonan kurdan o. O tecrîdo giran o ke rayberê şarê Kurdî Abdullah Ocalanî ser de yo, heme şaranê Rojhelato Mîyanênî, şarê kurdî û heme merdimatî ser de yo zî.

Heto bîn ra bajarê Toronto yê Kanada de zî bi heman waştişî grevê vêşanîye ame destpêkerdene. Meclîsê Şarê Kurdî yê Toronto dest bi grevê vêşanîye yê 5 rojan kerd. ***BRUKSEL***






## Zîhnîyetê AKPyî nêweş o

**22ê teşrîna peyêne de taxa Guzelbahçe ya Îzmîrî de her mektebêk ra 30 kesan berdî konferansê bi nameyê ‘Pêxemberê ma û Konferansê Ciwanan.’ Konferans hetê Miftitiya Guzelbahçeye ra pê ameybî. Bê destûrê keyeyan wendekaran berdî konferans û konferans de vîşêrê îfadeyê zayendî, îfadeyê ke îstîsmarkerdişê domanan meşru kenî zî ameyî xebetnayîş. Konferans de regil sey nêweşî ameye nîşandayîş û emrê 15 serrî de diganebîyayîşê domanan meşru kerdî.**

**Endama Omidê Ciwananê Lîse Melodî Zengîne çîyê ke konferans de ameyî çuyayîş rexne kerde û dîyar kerde ke hewl danî zîhnîyetê Ensarî mekteban de vila bikerî.**

**Melodî qiseykerdişê xo de wina va: “AKP prosesê 16 serran de seba apeyberdişê komelî lîse û mekteban dagir kerdo. Xeylê keyeyan ra gerre yenî. Miftî vano xebera ma çin a, akademîsyenî konferans pê ardî. Regil nêweşî nîya. Zîhnîyetê AKPyî nêweş o.”** ***ÎZMÎR***

## Esnafê Ceylan Karavîl Parke dikanan padanî

Tirkîye de krîzê ekonomî vera xeylê şîrketî konkordato îlan kerdî û xeylê kesî zî dikananê xo padayî. Amed de nizdîyê 60 esnafê Ceylan Karavîl Parke êdî nêeşkenî kar bikerî û heqê kîraya dikananê xo bidî. Ceylan Karavîl Parke ra xeylê esnafî top eştî û dikananê xo padayî. Esnafê ke mendî zî êdî nêeşkenî kîraya dikananê xo bidî. Esnafî vayeya kîrayan vera 3ê teşrîna peyêne de seba 2 saetan dikananê xo nêakerdî û reaksîyon nîşan dayî vayeyan.

Derheqê babete de esnafan ra Ferat Mehmetoglu, wayîrê mexaze Îrfan Ayaz û Hêlîn Ozgezere qisey kerdî.

Esnafî qiseykerdişê xo de wina vatî: “Mîyanê yew serrî de se ra 50 kîra vaye bîyî. krîzê ekonom vila bîyo pêroyê welat. Ganî vengê esnafan bêro eşnawitiş. Xora Amed de rewşa ekonomî qet baş nîya. Esnaf û wayîrê fîrmayan wazenê rayîrberî fek vayekerdişê kîrayan ra vera bido. Eke esnafî yew bibî ti erjê Parke nêmaneno. Eke wina dewam bikero do xeylê esnafî dikananê xo padî.” ***AMED***



Ferat Mehmetoglu · Îrfan Ayaz · Hêlîn Ozgezer

## Hûmartişê serê payan eşteyê 12ê Êlule yo



Demê peyênan de Zindanê Tîpa Myî yê Manîsa zî tede xeylê zindanan de hepsîyan ser de hûmartişê serê payan yeno ferzkerdiş. Kesê ke prosesê derbeya leşlerî ya 1980î de ameyî tewqîfkerdiş qala caardişê serê payan de hûmartişî kerdî.

Derheqê babete de mexduran ra Alî Yildirimo ke derbeya leşkerî ya 1980î de ameybi tewqîfkerdiş qisey kerd û wina va: “Wexto ke qala zindana yeo kerdiş sere de Kenan Evren û Esat Oktayî yenî mi vîrî. Eke feydeyê caardişê aye wextan bibayêne do heme kesan ra ver Esat Oktayî ser bikewtêne. Caardişê aye wextî sey lekeya sîya ripelê tarîxî de nusîyayî.”

Bahattîn Ozeno ke mabenê tarîxanê 1980-90î de Zindanê Amedî de mendo, çîyê ke aye wextan de qewimîyayî sey wexşet bi name kerd û va: “Hûmartişê serê payan raybazê rutîn yê îşkenceyî yo. Zindanê Amedî de her tewir îşkence estbî. Eke nika zî nê çîyî bibî o wext sîstem yew o. Hedefo yewin binpaykerdişê kamî û şexsîyetê merdiman o. Ma do piştî bidî embazanê xo yê ke çalakîya grevê vêşanîye de yî.”

**Hepsî bêwayîr nîyî**

Yusuf Ozmeno ke badê derbeya 12ê Êlule ameyo tewqîfkerdiş raştê îşkenceyê xeylê giranan ameyo û qiseykerdişê xo de wina va: “Hûmartişê serê payan parçeyêko îşkenceyî yo. Ez zindanê Buca, Aydin û Stenbolî de menda. Aye wext seke şivan bêro pezanê xo bihûmaro bi giştan ma ameyêne hûmartiş. Labelê hepsîyê sîyasî tarîx ra nata xover danî. Doman, merdim û embazê ma bêwayîr nîyî.” ***ÎZMÎR***

## Tebervejîyayîş zî wer girewtiş zî qedexe yo!

Menga Gulane ra nata qezaya Licê ya Amedî de hema hema her hewte qedexeyê tebervejîyayîşî yeno îlankerdene, operasyonê eskerîyî yenê viraştene. Operasyonî zafane herêmanê sey Pêşêkevir, Koçeran, Ber Çîya, Speynî û Çemê Elika de yenê viraştene. Prosesê operasyonan de erzîyeno serê keyeyan, cipersayîşê hayîdarîya pêroyîye (GBT) yeno kerdene, hemwelatijî raştê heqaret û tehdayan yenê.

Wextê îlankerdişê qedexeyê tebervejîyayîşî de wezîfedarê Şîrketê Elektrîkî yê Dîcle yê Anonîmî (DEDAŞ) zî leşkeran dir pîya yenê mehlayan û cezayan birnenî. Cayê ke nuqteyê kontrolî ameyê ronayene de zî şarê herême yeno mexdurkerdene. Nê nuteyan de dest dîyeno serê xidayanê şarî ke wazenê seba zimistanî berê keyeyanê xo.

Dewijan ard vîrî ke serranê 90an de seba ke ê bieşkê xida biyarê fîş girewtêne û nê vatî: “Nê bicaardişî ramojnenê ke ma ancî agêrayê serranê 90an. Ma wazenê erzaqêk ke heta wisarî qîmê ma bikerê berê, la ê nêverdanê. Eke ê sereştişanê keyeyan de xidayê vêşîyî bivînê dest danê ser.” ***AMED***

www.arsivakurd.org

# 'Rengê Mor ê Siyaseta Kurd' bû mijara şanoyê



**Pirtûka ku Gultan Kişanak li girtîgehê nivîsiye ya bi navê 'Rengê Mor ê Siyaseta Kurd' ji aliyê lîstikvana şanoyê Julîde Kural ve li şanoya xwendinê tê lîstin. Tê plankirin ku lîstik di 27'ê kanûnê de bê lîstin**

Hevşaredara Bajarê Mezin a Amedê Gultan Kişanak ku qeyûm tayînî şûna wê hat kirin û piştre jî hat girtin, niha li girtîgeha Kandirayê ye û li wir pirtûka bi navê 'Rengê Mor ê Siyaseta Kurd' nivîsand. Di pirtûkê de çîroka 23 siyasetmedarên jin ên kurd tê vegotin û jinên Tirkiyeyê eleqeyek mezin nîşanî pirtûkê da. Lîstikvana sînema û şanoyê Julîde Kural jî biryar da ku pirtûkê li gor şanoyê amade bike.

Julîde Kural ewil pirtûkê dixwîne û difikire ku ev dikare bibe şano. Piştî demekê jin li ser pirtûkê tên cem hev. Di civînê de nivîskar û endama PM'ê ya HDP'ê Ayşe Berktay ji Kural re dibêje 'Em dikarin vê bikin şano'. Li ser fikra jinan Julîde pirtûkê ji nû ve bi baldarî dixwîne.

**Fikara estetîkê**

Kural got dema ku pirtûk xwendiye pir hestiyar bûye û wiha got: "Çavên min tije dibûn. Jinan pêvajoyên xwe vedigotin. Wêrekî û hêza wan ji bo min pir baş bû. Min got ez vê çawa bikim şano. Hinek pirsgirêk hebûn. Ya yekem hinek çîrok kurt, hinek dirêj bûn. Hinek jî rewşa heyî vedigot. Her tiştê di vê pirtûkê de ji jiyana rast dihat. Me dê ev bi awayekî bibira ser sahneyê. Di vî alî de fikara estetîkê xwe da der. Min seranserê havînê pirtûk xwend. Min her hevalek nas dikir. Bi rêya pirtûkê niha baştir nas dikim."

**'Çîroka her jinekê cuda ye'**


Julîde Kural di berdewamiya axaftina xwe de bi lêv kir ku çîroka her jinekê cuda ye û di encamê de hemû jin in û wiha got: "Kurd, elewî, sinî hene. Piraniya wan zewicandî û xwedî zarok in. Şanoya xwendinê di rewşa heyî de divê saetekê derbas neke. Ji ber divê çîroka 23 jinan wekhev bihata vegotin. Divê 390 rûpelên pirtûkê daketa 20 rûpelî. Ji bo 23 jin wekhev bên vegotin min hewl da. Ji lîstikvanên NÇM'ê Rewşan Çelîker, Rugeş Kirici, lîstikvana sînema û şanoyê Denîz Turkalî û ez. Em ê metnan bixwînin. Ji NÇM'ê wê hunermendên jin jî cih bigirin. Wê dikek ku muzîka wê jî hebe. Em ê hemû li dikê bin. Di sînevîzyonê de wê Fîlm Mor jî li gel me be. Gultanê gotibû ji bo têkoşîna azadiya jinên kurd bixe rûpelên dîrokê pirtûk amade kiriye. Em ê jî bi rêya hunerê û nasnameyên cuda careke din li dîrokê bi cih bikin. Ez çerkez im, hevalên kurd û ji Behrareş jî dê hebin. Bila ji aliyê cuda jî jin bên û pirsan bipirsin. Gelek girîng e ku jin dest bidin hev."

Lîstika ku tê hedefkirin wê saetek û nîv bidome, di 27'ê kanûnê de li Şanoya Kentê wê saet di 20.00'an de bê nîşandan. *STENBOL*






## Kanûna Japonyayê



Ji vê meha kanûnê re bi latînî "december (dehemîn)" tê gotin meha dehan a teqwîma kevin a Romayê îfade dike. Ev meh bi berfa xwe ji bo Ewropayê timî bi noelê re bûye hevnav.

Lê li nîvkureya bakur hemûyî jî piraniya xelkê vê mehê hêviya berfê dikin. Ev çapa îlustrasyona hanê jî şeva kanûnê li nîveka sedsala 19'an a Japonyayê xêz dike. Navê berhemê "Meguro Taikobashi Yuhi-no-oka", navê hunermendê çapê ku ev resim li ser ferşên çapê amadekiriye jî, Utagawa Hiroshige ye. Ev xêzên hanê jî nîşan didin ku berf û kanûn li her derî bi xisletên xwe hene. *PARÎS*

# Sînorên Trump jî derbas kirin

Bi navê xwe yê resen "The Jungle (Daristana Tropîk)" lîstikeke şanoyê ya nû li Îngilistanê, nexasim jî li Londonê gelekî serketî bû. Rexnegiran para bêhtir pesnê vê lîstika li ser penaberên li kampeke penaberan a Franseyê da, di warê aboriyê de kir ku hunermend û produktorên wê gelekî kar bikin û ji ber wê jî ji bo transfereke ber bi New Yorkê ve tercîheke maqûl diyar bû. Jixwe, lîstika bi navê The Jungle îşaret bi kampa penaberan Calais dikir ku xelkê bêhtir bi navê "Jungle" ew bi nav dikir.

Lê pirsgirêkek hebû; 3 ji lîstikvanan welatiyên dewletên serjimara wan para bêhtir misilman bûn ku Trump vîzedana wan da ku karibin biçin Amerîkayê yan asteng an jî gelekî zehmet kiribû. Ji derhênerên lîstikê Stepehn Daldry (derhênerê din Justin Martin e) dibêje, "Ecêb û sosretên sosirmet li dijî me bûn. Me zanî wê ji bo me gelekî zehmet be."

Axir, bi mehan Sting û Benedict Cumberbatch jî di nav de gelek navdaran, lîderên dînî yên weke kevne metranê Canterburyê û siyasetvanên mîna şaredarên New York û Londonê têkoşiyan da ku van her sê kesan bi îmtiyaz bikin û li derveyî qedexeya Trump wan bi cih bikin û bikin ku ew vîzeyeke çûna Amerîkayê bi dest bixin.

Sting û hevjîna wî Trudie Styler di nameya xwe ya ji sefareta Amerîkayê ya li Londonê re nivîsî û got, "Vê sedsalê hê tu lîstika din bi qasî The Jungle dema ku li Londonê de hat nîşandan, temaşevan bi xwe ve girênedan."

**Divê xelk vê serpêhatiyê bibihîze**

Yên ku vê şova şanoyê destek dikin, diviyabû ji bo ku vîze bê wergirtin, rayedaran razî bikin ku nîşandana vê lîstikê ne metirsiyeke ji bo Amerîkayê hem weke dewlet û hem jî li dijî welatiyên wê. Bi ser de jî diviya wan heman rayedar qanih bikirana ku lîstik di warê hunerî û civakî de li xêra Amerîka û welatiyên wê ye. Ji bo vê jî bi gotinên David Lan ku kevne rêveberê Yound Vic Theater a li Londonê ye, wan go-tiye, "Serpêhatiyeke me heye û bi ya me divê xelk bibihîze û bi tenê ev mirovên hanê dikarin vê serpêhatiyê vebêjin. The Jungle beriya biçe West Endê li vê şanoyê hatibû nîşandan.

Van hewldanan di dawiyê de encama xwe bi dest anî û ji bo her sê aktoran jî vîzeya Amerîkayê hat wergirtin; ev jî Ammar Haj Ahmad ku penaberekî ji Sûriyeyê ye ku bû welatiyê Brîtanyayê û du penaberên ji Îranê Moein Ghobsheh û Yasîn Moradî yê Kurd bûn.

**Li kampê Yasînê kurd**

Yasîn Moradî yê ku bi xwe kurd e, bi saetan di lêpirsînê de ma dema ket nav axa Amerîkayê; hinceta wan jî ew bû ku dema ew di ser Sirbistanê re dirêviya, şûnên tiliyên wî hatine qeydkirin. Lê niha her sê jî bi awayekî serketî û bextewar provayên xwe dikin li hola Dumbo ya li Brooklynê.

Em ji derhênerên şanoyê fêr dibin ku wan Moein Ghobsheh ê 23 salî û Yasîn Moradî yê 26 salî ku hosteyekî kung-fu ye, li kampa Calaisê nas kirine û ew birine Îngilistanê. Yasîn Moradî dibêje, ew ji Îranê reviyaye, ji ber ku ji bo kurdan Îran her çûye xerabtir bûye û jiyan her ne pêkan bûye. Wî li kampa Calaisê, dersa kung-fuyê dida penaberan, dema ku şanoya li Londonê ew nas kir. Bi ya wî ev lîstik wê alîkar be ku ew karibin serpêhatiya xwe vebêjin. *NEW YORK*

## Muzîka Reggae êdî bû malê dinyayê

Rêxistina Çand, Perwerde û Zanistê ya Neteweyên Yekbûyî UNESCO biryar da ku muzîka Reggae di navê lîsteya çandî ya navneteweyî de cih bigire û were parastin.

Ji sala 1960'an ve bi xêra stranbêjên navdar ên weke Toots and the Maytals, Peter Tosh û Bob Marley Reggae, "Bi awakî manewî ket lîsteya dewlemendiya çandî" UNESCO muzîka reggae weke mûzîka "zîhnî, sosyopolîtîk, hîsî û ruhî" pênasekir. UNESCO'yê diyar kir ku muzîka Reqqaeyê bi berxwedan, edalet û evînê li ser mirovahiyê bandoreke erênî çêkiriye. *AMED*



# Ev pirtûk berî 100 salî nikarin bên xwendin

Li paytexta Norwêc Osloyê pirtûkxaneya pêşerojê tê ava kirin. Di pirtûkxaneyê de dê tenê pirtûkên ku piştî sed salî karibin bên xwendin, hebin.

Projeya bi navê "Future Library" (Pirtûkxaneya Pêşerojê) bi pêşengiya hunermend Katie Paterson bi cih tê anîn. Bi projeyê re tê xwestin, her sal pirtûka nivîskarekê/î bê komkirin ku tenê pêşerojê karibin bên xwendin.

Pirtûkxane wê sala 2114'an li gel bê vekirin û her sal berhemek lê bê bicihkirin. Berhema destpêkê ji aliyê nivîskara kanadayî Margaret Atwood ve diyarî pirtûkxaneyê hate kirin. Ya balkêş ew e, piraniya nivîskar an jî xwendevanên pirtûkên werin nivîsandin, hîn ji dayik nebûne.

Her wiha gelek nivîskar, berî ku bibihîzin bê berhema ji pirtûkxaneyê re hiştiye çawa hatiye rexnekirin, dibe ku jiyana xwe ji dest bidin. Aliyekî din ê balkêş ê pirtûkxaneyê jî ew e; dema ku sal bû 2114 dibe ku êdî dijîtalbûyîn bi temamî li ser cîhanê serdest be. Yanî, dibe ku piştî 96 salan pirtûk nema bên çapkirin.

Pirtûk wê li mezintirîn pirtûkxaneya Norwêcê li Deîchmanske Bîblîotekê werin komkirin û li benda xwendevanên xwe bin. *OSLO*



www.arsivakurd.org